

## Lêgerîna kesên ku li Yewnanîstanê wenda bûne

Ew kesên ku mervantî, nas û hevalên xwe li ser rêya Ewropa'yê wenda kirine, ji Alarm Phone'ê re gelek pirsan sewal dikin. Em dizanin ku ev rewş gelek dijwar e û gelek caran tiştên ku bên kirin nayên zanîn.

Ev tiştên ku li jêr nivîsandî, zanyarî û agahiyên ji alî Alarmphone li ser tecrubeyên kevare hatiye berhev kirin in, ser meselê: di Berfanbara sala 2021an wexta 4 keştî çû nav ava; ev tişt qewimîn. Di lêgerînê de desthilatdarên Yewnanî tu carî agahiye nadin û alîkar nabin.

Em hêvî dikin ku ev agahî wê ji we re alîkar be. Heger mervantî yan jî hevala/ê we di nava bahrê Yewnan yan jî Bakurê Yewnanîstanê wenda bûbe; gavên li jêr bişopîne:

### Gava 1. emîn(ewil)

Belgeyêkî di derbarê we kesê ku wenda bûye amade bike û bila agahiyên jêr têde bin:

- Nav û paşnavê yê/a wenda
- Navê dê û bavê wî/ê
- Cihê ku ji dayîk buyê
- Çend salî ye?
- Kopyayên belgeyên wî/ê yên ku hene ( peseport yan ji nasname)
- Nimra telefona wî/ê
- Texmên wî/ê yên GPSê (ên ku ew li wan bû, berî ku wenda bibûya)
- Berî wenda bibe li ku bû?
- Çi li xwe kiribû? (Kinc.. hwd..)
- Kî pê re bû? Herî dawî kî wê/wê dîtibû?

Ev belge dema lêgerînê wê hewce be. Dibe ku tu ev belge bide desthilatdaran jî. Wexta te daxwazî ji bo kesê/n wenda ji desthilatdarên Yewnan kir; **nimra protoqolê** jî ji wan bixwazê. Ev nimre tê wê mahnê ku te daxwazîya xwe ispat kir û kir fermî. Ji bo lêgerîna te jî wê dawiyê hewce be.

### Gava 2. (duyemîn)

#### Biçe Xaç Sor

A. Biçe Xaç Sor a Yewnanîstanê ji bo qeydkirina ew kesê/n wenda

Li jêr du cihên yên tu dikarî têkevê têkiliye nivîsandiye:

#### ICRC Athens Delegation

Panepistimiou street 25-29

Athens 10564 - Greece

Tel: [+ 30 210 8259069](tel:+302108259069)

Fax: [+ 30 210 8832546](tel:+302108832546)

Email: [ath\\_tracing@icrc.org](mailto:ath_tracing@icrc.org)

#### Hellenic Red Cross

Tracing Service

21, 3rd Septemvriou

104 32 Athens - Greece

Tel: [+30 210 523 0043 \(8.00am - 14.00pm\)](tel:+302105230043)

Fax: [+30 210 523 7700](tel:+302105237700)

Email: [tracingstaff@redcross.gr](mailto:tracingstaff@redcross.gr)

B. Biçe **Xaça Sor a li cîhê ku tu îkamet dike** û ji xizmetên TRACING'ê bi hemû agahîyan qeyda ew kesê/n wendayî çêke. Dibe ku ew bi xwe lê negerrin, lê dîsa jî desthilatdarên din wê bizanibin ku tu li wê/wî gerriyaye.

Ew kesên ku li mervantiyeke(Dê, Bav, Xwe, Bira, Jin, Mêr, Zarok) digerrin divê ku bi **National Society** yan jî **ICRC delegation** 'e re têkevin têkiliyê. Ev der belge sewal nake. Malpera wan ICRC RFL ev e: <http://familylinks.icrc.org/>

Di seriye malperê de pêl "CONTACT US" bike. Dawiyê welatê ku tu lê îkamet dike biceribîne. Dawiyê agahiyên têkiliyê jî bo RC/RC RFL wê xwiya bike.

Heger îcab bike, National Society yan jî ICRC wê dawiyê bi desthilatdarên din têkeve têkiliyê. Bi vê yekê şopandin rehet dibe. Agahî ji vir: <https://familylinks.icrc.org/how-it-works>

Dewsa çûna wura, mail şandin jî mumkun e û ev dibe ispata nivîsandî, lê dibe ku tu bersivê negre. Heger tu bersivê negre, li wan bigerre û ji ofîsa heremî randevûyekê bigre.

### **Gava 3.emîn(sêyemîn)**

Mervantiyên ew kesê/n ku wendayî, heger îmkan û pere hebe, dikarê biçe Yewnanîstanê jî bo lêgerrînê. Lêgerrîna şexsî dikarê lêgerrîne bike zûtir û bêhtir bi bandor.

Bi belgeyên qeydê yê ku te ji Xaça Sor girtiye, tu dikare biçe "Coroner"ê yan jî qereqola polêsan li ew bajarê ku ew kes lê wenda bûye. Tu dikare jî bo alîkariye bi NGO'yên weki Greek Refugee Council (GCR) jî bipeyve.

Binere:

<https://www.gcr.gr/en/>

**Coroner for the North of Greece/Evros:**

General University Hospital of Alexandroupolis  
Adress: Alexandroupoli 681 00, Greece  
Telephone: +30 2551 353000

Biçe vira û ji Dr. Pavlidis bipirse. Ew coronerê bi herî tecrube ye li heremê.

### **Gava 4.emîn(çaremîn)**

**DNA:** Piştî tu çû Xaça Sor a Yewnanîstanê, heger tu mervantiyê ew kesê ku wenda bûyî be, tu dikarî DNA'ye xwe jî bide polêsan jî bo ku naskirin bê kirin.

### **Gava 5.emîn(pêncemîn)**

Zanibe ku **Alarmphone ji bo muameleyên cenazê nikari alîkari bike**. Ji bo cenazê, divê tu bi coroner, konsolosî yan jî bi civata herema xwe re bipirse.

**Daxwaziya me ew e ku; tu wendayiyê xwe bi saxî bibîne. Ger ku tu wan bibîne, ji kerema xwe re agahiyê bide Xaça Sor ku ew jî êdî pê zanibin.**

**Tiştên ku wekî din tu pê zanibe:**

Heger ew kesê/n ku wendayî di bin çav de be, bi NGO'yekê ku parêzerê wan heye re têkevî têkiliyê. Ser meselê: Tu dikari bi Greek Council of Refugees (GCR) yan jî Legal CenterLesvos têkevî têkiliyê.

Gelek caran telefonên kesên ku digêhelje cîhên xwe ji alî polês û leşkeran tîn girtin. Ji ber vê yekê, nimre bila di hişê we de be.

**Beyê evan, tu dikare têkevî tîkiliyê;**

-bi **polêsên bahrê (CoastGuard) ê heremî** yê Yewnanistanê. Gelek caran memûrên wan bersivan dide pirsên we, navên ew kesên wedayî digrin û lê dinerin.

- **Coronerê heremî**. Belgeyê ku te di gava ewil de amade kiribu bide wê/wî.

- **Nexweşxaneyên heremî**. Dibe ku ew kesên wendayî hatibe vira.

---

**BALDAR BE!!! DÎQQET BÎKE!!**

**Hinek caran, hinek kes mirov dixapînin**, bo derewan dibên “me ew kes dîtiye” û bi mahna nîşandana ew kesên ku wendayî, pere ji meriv digrin. Nexape!

---

**Tiştên ku wekî din tu dikarî bike:**

Tu dikare **şikayetnameyekê bide** GREEK OMBUDSMAN

<https://www.synigoros.gr/en?i=stp.en.home>

û her weha, ji rayedarên din ên heremî re heke hûn dixwazin gilî li ser prosedûra ku rayedarên Yewnanî bikar tînin ji bo: agahdarkirin, piştgirî, lêgerîn û naskirina endamê malbata xwe bikin.

Heger tiştên ku wekî li jêr nivîsandî qewimîbe, binivîse:

- \* ji alî deshilatdaran tu agahî neda daan
- \* qet alîkarî nebû ji alî memûrên heremî
- \* wergera ziman tunebû
- \* nimra protoqolê nehat daan
- \* ji alî Xaça sor tu agahî neda daan

Endamên malbatê an jî kesên hevkar dikarin nameyek fermî bi posteyê bişînin, bi meqbûza (bi navê SYSTIMENI EPISTOLI) ku jimareyek elektronîkî werdigire.

Name divê ku bê şandin ji:

- 1. Coroner (bi Yewnanî Iatrodikastis) ya nexweşxaneyê herî nêzîk**
- 2. Goristan (bi yewnanî: Nekrotafio) bajarê herî nêzîk**
- 3. Xaça Sor**

bi giliyên mîna Ombudsmanê Yewnanîstanê  
û **bi daxwaz ji wan kir ku destwerdanê bikin.**

**Her dem nimra tîlefonê û navê kesê ku dikare pê re tîkilî daynin da ku agahdar bibin.**